

Heyf û mixabin, seet 11:05'ê roja pêncşem, 11.10.2007'an, rewşenbîrê navdar û wêjevanê mezin yê Kurd, **Mehmet Uzun** li bajarê Amedê çû ser dilovaniya xwe û bo yekcarî xatir ji gel û welatê xwe xwest.

Peyama sersaxiya Politbüroya PDK Îranê Desteya Weşana Agiri di rûpela 2 û 11'an de...



Daxuyaniya Derheq
Dijberî Tevî Îdamê Û
Biryara Darvekirinê...



2

Guhertinên Rûyekî
Dê Turkiyê Ber Bi
Kuderê Bibin?




5

Miletê Kurd Li
Sûriya Û Pirojeya
Hejmartina 1962'an



6

REWŞ



9

Bîranîna Apê
Mûsa Enter



10

1920-1992

Bangawaza Partiyên Kurd û Kurdistanî Ji Bo Bîr û Raya Giştî:

“EM NEHÊLÎN DEWLETA TURK REWŞA ROJHÎLATA NAVÎN ALOZTÎR BIKE”

Dewleta Turkiyê xwe ji bo êrşa leşkerî bo nav axa Herêma Kurdistanê amade dike û hêzeke zaf aniyê ser sînorên Herêma Kurdistanê û berdeham gefan dixwe.

Serok Wezîrê Turkiyê, Erdoxan got ku Turkiyê amade ye ku hemû xisar û bacan bona êrîşa bo nav axa Herêma Kurdistanê bide.

Desthilatdarên Turk dibêjin, ew êrîşa wan ji ber hebûna hêzên PKK'ê li Herêma Kurdistanê ye. Lê weke xuya ye armanca sereke ya dewleta Turk, pêşgirtina geşkirina ezmûna Kurdistanê ye, ne binke û baregehên PKK'ê.

Amerîka û Yekîtiya Ewropayê hişyarî dan Turkiyê ku nabe êrîşe bo ser Herêma Kurdistanê bike.

Qîrar e roja sêşem a vê hefteyê Parlamentoya Turkiyê li ser bezandina sînorên Herêma Kurdistanê biryarê bide. 12 Partiyên Kurd û Kurdistanî di daxuyaniyekê de bo raya giştî û rêxistin û komeleyên navneteweyî daxwaz kirin ku nehêlîn dewleta Turk rewşa Rojhilata Navîn aloztir bike.

Daxuyani di rûpela 3'an de

Komîsyona Karê Derve Ya Kongressa Amerîkayê
Pêşniyara Qanûna Jînosayda
Ermeniyand Pejirand Pejirandiye

Komîsyona Karê Derve Ya Kongressa Amerîkayê, yasayeke pêşniyarkirî pesend kiriye ku li gor wê, Ermenî di dema



Şerê Yekem yê Çîhanî hatine jînosaydkirin. Qanûna pesendkirî ya han têkiliyên navbera Amerîka û Turkiyê bi tirsê re berbirû kirine. Buş bi xurtî hişyarî da Kongressê ku ew yasayê ne pejirîne. Ajansa Nûçeyan a "BBC"yê da zanîn, serbarê helwesta tund ya Turkiyê û gefên Serok Komarê Amerîkayê, egera vê yekê heye ku yasaya jînosaydkirina Ermeniyand di Kongressê de bihê pejirandin ku piraniya wê di destê Partiya Demokrat de ye.

Li sala 1915'an, li ser û bendê Şerê Yekem yê Çîhanî û serhildana Nasyonalîzma Turk, dewleta Osmanî dest da Siyaseta asîmîlekirinê û 1.5 Milyo Ermenî qir kirin.

Kazim Darabî, BiKujê
Dr. Şerefkendî Û Hevalên
Wî Serbest Tê Berdan!

Dozgerê Giştî yê Almanyayê roja pêncşem, 11.10.2007'an da xuyakirin ku ew dê Kazim Darabî, yek ji sebebkarên terora Mîkonosê ya li dijî Dr. Şerefkendî û hevalên wî serbest berdin. Frank



Walenta da zanîn ku Darabî 15 sal e di girtîgehê de ye û cezaya wî ya din dê were efûkirin. Qîrar e ku di meha dawî ya sala 2007'an were azadkirin.

Kiryareke wiha ji bilî bêhurmetî bi nîrx û pîrensîpên mirovahiyê û binpêkirina mafên mirovan tu peyameke din peyre tune, lewra divêt rê û derfeta serbestberdana van tawanbarane nehê dayîn û hewl û xebata vê yekê jî were dan ku rêberên rejîma teror û tawanê a Komara Îslamî a Îranê jî wekî biryarderên vê cinayeta terorîstî di dadgeheke navneteweyî de bi cezayên xwe bigihîjin.

Daxuyaniya Çapemeniyê A Bîroya Nûneriya Derveyî Welat A PDK Îranê Derheq Dijberî Tevî Îdamê û Biryara Darvekirinê

ROja çarşem, 10.10.2007'an, Roja Cîhanî a li dijî cezayê îdamê ye. Di wê rojê de Koma Cîhanî ya li dijî îdamê (World Coalition Cuntres The Death Penalty)

pêkhatî ji rêxistinên mafê mirovan di koşka navenda Neteweyên Yekbûyî li bajarê "New York"ê, konferanseke çapemeniyê bi boneya çil sa xebat li dijî rakirina biryara îdamê pêk tînin.

Di hejama 40 salên borî de, 130 welat ji 192 welatên endamê Neteweyên Yekbûyî qanûna fermana îdamê rakirine. Koma Cîhanî li dijî cezaya îdamê, pêşniyabiriyarek ji bo bas û biryardanê di civîna roja 10'ê Çirya Pêşîn a 2007'an, bi armanca qedexekirina yasaya hukmê îdamê di hemû welatên cîhanê de pêşkêşî Sekreterê Giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî kiriyê.

Li sala 2006'an, di 25 welatan de, biryara îdamê birêve çûye ku 11 ji sedê a wan îdamtan tenê li 6 welatan hatiye meşandin, ji wan welatan Çîn û Îran di serî de ne. Di navbera sala 2006 û 2007'an, hejmara îdamtan li Îranê ji çend salên bihurî zêdetir bûn. Li gorî serhejmarîyên fermî, tenê di sala 2006'an, aliyê kêr 215 kes hatine îdamkirin.

Her niha dehan girtiyên siyasî û civakî di

reşçalên Komara Îslamî a Îranê de ne ku li benda birêveçûna hukmê îdamê ne. Ji wan kesan em dikarin basa rojnamevanên Kurd, Ednan Hesenpûr û Hîwa Botîmar bikin ku tenê bi tawana Kurdbûnê û berevanî li mafê azadiya raderbirinê ji meha Tîrmeha vere biryara îdamê bi ser wan hatiye birrîn.

Di Roja Cîhanî a li dijî cezayê îdamê, em tevî hevdengî bi hemû rêxistin û kesayetiyên re ji bo rakirina hukmê îdamê û daliqandinê, bala civata navneteweyî, rêxistinên mafê mirovan, Neteweyên Yekbûyî û Konseya Ewropayê bo aliyê rewşa dijwar û bixof a mafê mirovan li Îran û Kurdistanê dikişînin û em daxwaz dikin ku bi zext û givaşxistin bo ser wê hikûmetê, pêşiya îdamê yan kuştinên enqest ên dewlet bigire.

**Partiya Demokrat a Kurdistanê
Îranê
Bîroya Derveyî Welat, Paris –
09.10.2007**

Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Bona Koça Dawî Ya Mehmet Uzun Sersaxî Da Gelê Kurd

► Em pê hesiyar ku mixabin **Mehmet Uzun**, wêjevan û romannivîsê navdar yê Kurd roja pêncşem, 11.10.2007'an, bi sedema nexweşiya penceşêrê li bajarê Amedê çû ser dîlovanîya xwe.

Meytê wî nemirî roja şemî, 13.10.2007'an bi beşdariya dehan hezar kesan li bajarê Amedê hate veşartin.

Mehmet Uzun endamê çelengê PEN'a navneteweyî û Yekîtiya Nivîskarên Swêdê bû. Sala 2001'an xelateke mezin ya wêjevî a wî welatî stand û sala 2005'an jî ji aliyê Wezareta Çandê a Hikûmeta Herêma Kurdistanê hate xelatkirin.

Mehmet Uzun gelek pirtûk nivîsandine ku piraniya wan bi zimanê Kurdî ne û nivîsarên wî bi yek ji pirtûkên herî dawlemend û xurt ên romanên Kurdî û deqên wêjevî di Zarava Kurmanciya Jorîn ya zimanê Kurdî tînin hesabandin.

Bêguman ji destçûna nivîskarekî xwedî şiyar û karîna wekî Mehmet Uzun xisareke mezin ji bo ziman û edebiyata Kurdî bû.

Deftera Siyasî ya PDK Îranê tevî xuyakirina xem û kovanên xwe bon ji destçûna nemir Mehmet Uzun, behî û serxweşiya xwe ji malbata wî a qedirgiran, rewşenbîr û nivîskarên Kurd û hemû neteweya Kurd dike.

**Deftera Siyasî ya PDK Îranê
14.10.2007**

Şandeke PDK Îranê Tevî Şandeke Mezintir A Rêxistina "UNPO"yê Di Civîna Şeşem A Konseya Mafê Mirovan A Neteweyên Yekbûyî De Li Jenevê Beşdarî Kir

Şandeke PDK Îranê pêkhatî ji rêzdarên: **Ebdula Hicab**, nûnerê PDK Îranê li rêxistina "UNPO"yê û **Ako Elyasî** nûnerê PDK Îranê li

welatê Swîsê, ji rêya "UNPO"yê ve, rojên 24 û 25'ê Îlona 2007'an, bo cara yekemîn di civîna wêzane a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de li "Genevê"ê beşdarî kir.

Bernameya karê roja 24.09.2007'an a "UN"ê ji bo bas li ser bînpêkirina mafê mirovan di welatên cur bi cur de hatibû terxankirin ku di wê beşê de, welatê Portugalê bi nûneriya Yekîtiya Ewropayê, bi eşkere, rejîma Komara Îslamî a Îranê ji ber bînpêkirina mafên mirovan şermezar kir û piştê şanda welatên Amerîka, Almanîya, Îngilîstan, Kanada, Swêd û çend welatên din, gelek bi xurtî rejîma Komara Îslamî a Îranê ji ber pêpêskirina mafên mirovan rexne kir. Di vê derbarê de Desteya Nûneriya Hikûmeta Almanîyayê, îdama nêzik bi 200 kesan di çend mehên derbasbûyî de û derkirina biryara neqanûnî li dijî rojnamevan, cudabîr û kevirbaranê weke mînak anî holê û daxwaz kirin ku bila rayedarên Îranê dawiyê bi bînpêkirina berdewam û sistematîk a mafên mirovan û çewisandina kêmaniyên neteweyî, olî û xebatkarên mafê mirovan binin. Herwiha wan bi mîcidî ji Îranê xwestin ku cezayê îdamê û ricimkirinê rake.

Weke hate gotin, welatên han derheq rewşa nebaş a mafên mirovan bi giştî û nemaze di bin zext û givaşxistina Kêmetneweyan, çendîn belge û dokumanterên rast û ne cihê înkarkirinê anîn û daxwaza şirove û rohnkirinê ji rejîma Komara Îslamî a Îranê kirin. Di hember de, Elîrîza Muîrî bi nûneriya şanda rejîma Îranê, kevirbaran, girtin û îşkence li Îranê, tevî usûl û pîrensîbên Îslamî û yasayên

Welayeta Feqîh hevterîb hesabandin. Her di vê çarçoveyê de û derbarê bînpêkirina mafê mirovan, rexneyên tund rabeî welatên wek Kureya Bakûr, Sûdan, Kuba û Ozbekistanê hatin kirin.

Her di vê derheqê de, rewşa welatên: Îraq, Darfûr û Srî Lankayê jî bûne bi yek ji aliyên mijarên civînê tê yê Konseya Mafê Mirovan ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî.

Basên roja 25.09.2007'an a civîna demsalî a Konseya Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ji bo bas li ser xebat li dijî nejadperestî û ferq û cudahîdanan û herwiha çawaniya rêvebirina daxuyaniya "Dorban"ê û bernamêya piştgiyariya UN"ê ji bo mafê xwendinê hatibû terxankirin.

Di dema birêveçûna gerra şeşem a civînê werzî ên Konseya Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî li navenda UN"ê li Jenevê, şanda PDK Îranê serbarê beşdarîkirina ser û ber di civînê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî û "UNPO"yê de, çendîn hevdîtin tevî sazî û kesayetiyên cur bi cur pêk anî ku li jêr em dê bi kurtî qala wan bikin:

1. Amadekirina nameyekê li ser rewşa mafê mirovan li Îranê û Kurdistanê Îranê û pêşkêşkirina wê ji rêya Federasiyona Navneteweyî a Parastina Mafê Kêmaniyên Neteweyî, Olî û zimanê Kêmetneweyên din, bi serokê Konseya Mafê Mirovan neteweyên Yekbûyî.

2. Civîna tevî Rêporterê taybet yê UN"ê ji bo neteweyên xwecih (bomî) û pêşkêşkirina çendîn dukoment û belgeyên partiye li ser rewşa mafê mirovan li Kurdistanê Îranê.

3. Civiyana û hevdîtin bi nûneriya Jenevê a Fedrasiyona Parastina Mafê Kêmetnewan û şîrovekirina rewşa nebaş a mafê mirovan li Kurdistanê Îranê û bi taybet basa girtin û



Ako Elyasî û Ebdula Hicab

dasepandina cezayê îdamê ji bo **Ednan Hesenpûr** û **Hîwa Botîmar** û girtina **Mihemedsidîq Kebûvend** û daliqandina **Mihemedrîza Şucaî Nîko** û xebatkarên din ên hundirê welat.

4. Hevdîtin tevî şandên beşdar di civînê Rêxistina "UNPO"yê

5. Dana nameyê bi birêz **Fîlip Alston**, Rêporterê taybet li ser îdamê û kuştinên dereqanûnî

6. Hevdîtin tevî Rêxistina "Human Rights Watch"ê

7. Hevdîtina tevî Rêxistina "Geneva Calle"ê

8. Herwiha heta wî cihî ku derfet pêk hatibe, şanda PDK Îranê bi sand û heyetên fermî ên welatên cur bi cur re hevdîtin pêk aniyê û ji wan re basa rewşa xirab a mafê mirovan kirin.

Hêjayî gotinê ye, roja yekşem, 23.09.2007'an, li Jenevê di xwenîşandaneke de ku ji aliyê Rêxistina "UNPO"yê ve bona rakişandina bala raya giştî bo ser mafê mirovan li Herêma Xumr Krom li Laosê hatibû organîzekirin, beşek ji endam, alîgir û dostên PDK Îranê li ser daxwaza Komîteya Swîsrayê a partiye bi awayekî çeleng beşdarî kirin.

Hêjayî gotinê ye ku Rêxistina "UNPO"yê her salê ji bo piştevanî ji neteweyek bê welat, xwenîşandane li dar dixê.

Bangawaza Partiyên Kurd û Kurdistanî Ji Bo Bîr û Raya Giştî: “Em Nehelin Dewleta Turk Rewşa Rojhilata Navîn Aloztir Bike”

Dewleta Turk hinek çalakiyên PKK'ê ji xwe ra kiriye hêcet û mihane û xwe amade dike ku operasyoneka serbazî di axa Kurdistana Başûrê da çê bike.

Partiya Dad û Pêşveçunê (AKP) jî, ji bona vê armanca kirêt, ji Meclîsa Turkiyê daxwaz dike, ku desthilatdarî bidine hikûmetê, daku leşker bişînine Kurdistana Başûrê.

Ji bona bîr û raya giştî eyan e ku armanca dewleta Turk, ne binke û baregehên PKK'ê li Kurdistana Başûr e. Armanca serekî ya dewleta Turk, pêşgirtina geşkirina Ezmûna Kurdistanê ye.

Generalên Turk gellek caran ragihandine û gotine ku “Hikûmeta Herêma Kurdistanê li ser asayîşa netewî ya Turkiyê xeter e.” Li gor bîr û bawerîya generalên Turk û karbidestên dewleta Turk, dema Kurda çarenivîsa xwe bi xwe diyar bikin, dibine xeterek li ser Turkiyê!. Ku diyarîkirina mafê çarenivîsê yek ji mafên serekî ya mirovan e û Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî daxwaz û îradeya Kurdên Başûr e.

Hikûmeta Herêma Kurdistanê ne tenê daxwaz û îradeya Kurdên Başûr e, ew her usa di Îraqa Federal da zaminê aramî û aşîtiyê ye. Hikûmeta Herêma Kurdistanê tenê destkefta gelê Kurd nine, destkefta hemû hêzên aşîtiyê û azadîxwazên navçeyê ye. Ji bo vê yekê her operasyona leşkerî û her destêverdana



dewletên cîran, ne tenê lêdan û lawazkirina Hikûmeta Herêma Kurdistanê ye, her usa lêdana hêzên aşîtxwaz û azadîxwaz ên navçeyê ye.

Dewleta Turkiyê di wan 25 salên dawiyê da, di axa Kurdistana Başûr de, 24 caran operasyona leşkerî çê kiriye. Lê belê tu caran negihîştîye armanca xwe. Bê guman vê carê jî nagihîje. Operasyona leşkerîya Turkiyê rewşa siyasî ya navçeyê aloztir dike ku îro Navçeya Rojhilata Navîn hewcedarî aramî û asayîş e, ne alozî û tevlihevî.

Guman têda nine ku bandora alozbûna rewşa siyasî ya Rojhilata Navîn, li ser siyaseta cihanê heye. Ji bona vê yekê;

Em partiyên Kurd û Kurdistanî ji Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, ji Dewletên Yekbûyî ya

Amerîka, ji Peymana NATO, ji Yekîtiya Ewropa, ji dezgeh û saziyên mafên mirovan yên navnetewî daxwaz dikin, ku pêşiya operasyona leşkerîya dewleta Turk bigrin;

Em Partiyên Kurd û Kurdistanî ji hêzên demokrat û aşîtxwazên Turk dixwazin ku dengê xwe diji şerxwaziya dewleta Turk bilind bikin, bibine alîkar û piştgirê Hikûmeta Herêma Kurdistanê;

Her di vê demê de, em ji PKK'ê dixwazin ku guhê xwe bide bangawaza Serokê Herêma Kurdistanê, birêz Mesud Barzanî û kar û çalakiyên xwe wisa rê bixe, ku nebe hêcetêk destê dagirkerên Kurdistanê.

Em partiyên Kurd û Kurdistanî radigihînin, ku diji her cure desttevardana dewletên dagirker in di kar û barên hundir ên Kurdistana Başûrê da.

Navên partiyên îmzakirî:

- Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
- Partiya Sosyalîsta Kurdistan-PSK**
- Partiya Demokrata Kurdistanê-PDK Bakur**
- Partî Demokratê Kurd Li Sûriyê (EI partî)**
- Partiya Pêşverûya Demokrat a Kurd Li Surî**
- Partiya Yekîtiya Demokrat ya Kurd Li Sûriyê**
- Partiya Welatparêzên Demokrat ên Kurdistanê-PWD**
- Partiya Azadî ya Kurd Li Sûriyê**
- Partiya Yekîtiya Kurd Li Sûriyê**
- Rêkewtina Demokrat a Kurd li Sûriyê**
- Partiya Azadiya Kurdistanê-PAK**
- Rêxistina Xebata Kurdistana Îranê**

Civîneke Berfireh Ji Aliyê YCDK Îranê Ji Bo Rêzdar Mistefa Hicrî, Hate Lidarxistin

Bi armanca baskirin li ser rewşa ciwanan, rola ciwanan di tevgera netewî – demokratîk a gelê Kurd li

Kurdistana Îranê û erk û wezîfeyên niha û pêşerojê ên ciwanan çi ne?, roja 05.10.2007'an, seet 15:30'an, Komîsyîna Fêrkirin a Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê, di doma xebat û çalakiyên xwe de, civîneke berfireh ji bo rêzdar **Mistefa Hicrî**, Sekdreterê Giştî ê PDK Îranê pêk anî.

Di destpêka civînê de **Dara Natiq**, Sekreterê Giştî yê YCDK Îranê axavtinek kir û di gotinên xwe de tevî xêrhatin kirin ji kekê Mistefa Hicrî û endamên din ên rêberîya PDK Îranê û tev endamên Yekîtiya Ciwanan û mêvanên din, bal kişande ser piştgiriya berdewam û berfireh ên PDK Îranê ji YCDK Îranê. Wî di axavtina xwe de xuya kir ku YCDK Îranê PDK Îranê wekî rêberê revgera azadîxwaziya neteweya Kurd li Kurdistana Îranê dizane û li ser vê baweriyê ye ku di çarçoveya siyasîyên rast û azîn û usûlên dirust ên Partiya Demokrat neteweya Kurd li Kurdistana Îranê dikare bigihîje maf û azadiyên xwe.

Birêz Dara Natiq her wiha qala rewşa kar û çalakiyên ve saziyê piştî kongireya çaran kir.

Piştê rêzdar Mistefa Hicrî civîn bi pirozkirina dubare a kongireya çaran a YCDK Îranê û her wiha sala nû û xwendinê ji ciwanan re, dest



Rêzdar Mistefa Hicrî, 05.10.2007

pê kir. Di destpêka basa xwe de, rêzdar Hicrî bi kurtî derheq rola Komara Kurdistanê li nasîna xwestek û daxwazên senfî ên ciwan û jinan axivî ku ji wê demê şûn de PDK Îranê di hemû qonaxên cur bi cur ên xebata xwe de pûte û girîngî daye van du tex û qatên civaka Kurdistanê.

Kekê Mistefa Hicrî anî ziman ku PDK Îranê hemû demêkê piştgiriya ji xebata ev çîn û texên civakê dike û got: “Hemû tex û çîn civakê pêk tînin, em bê wan nekamil in û ew hevdu dikemilînin”.

Birêz Mistefa Hicrî di doma axavtina xwe de bask li ser rewşa şoreşa gelên Îranê û beşdariya çeleng û aktîv a ciwanan wek qatek guhertinxwaz a serdem kir û diyar kir ku

ciwan hemû demêkê yek ji aliyên zext û givaşan li ser desthilatê ne.

Dûre derbarê beşdariya çeleng a ciwanan di xebata neteweyî de got: “Endamên Yekîtiya Ciwanan hergav mil bi milê Pêşmergên PDK Îranê xebat kirine û di vê rêyê de şehîd jî dane...”.

Rêzdar Hicrî rola ciwanan di civakê de bilind hesaband û got: “Fikr û ramanên nû di nîfşa nû de ne, serkut binpêkirin û neparastina xwestek û daxwazên ciwanan, serkut û çewisandina pêvajoya pêşketin û geşkirina civakê ye”.

Di doma axavtina xwe de, birêz Hicrî bask berfireh li ser rola ciwanan û rewşa ciwanên Kurdistana Îranê ku îro rastî siyasîyên qirêj û şaş ên Komara Îslamî hatine û derfet û fersenda xweperwerdekirin û geşkirina û pêşdeçûnê tu ninin.

Di dawîya axavtina xwe de kekê Mistefa Hicrî daxwaz ji ciwanên azadîxwaz û hişyar ên Kurd kir ku ji bo rizgariya neteweya xwe di bin destê rejîma gemar a Komara Îslamî ya Îranê bi awayekî çeleng û ektîv di xebata neteweyî de beşdariyê bikin.

Di beşa din a civînê de, beşdarên keç û kur bi awayekî çeleng beşdarî basa kekê Mistefa Hicrî û bi rexne û pêşniyarên xwe civîn bêtir dewlemend kirin û rêzdar Mistefa Hicrî jî bersiva pirsên beşdaran da.

Hêjayî gotinê ye ku di civîna han de, beşeke zaf ji endamên YCDK Îranê li binkeya Deftera Siyasî, kamp û bargehên partiyê û li derveya partiyê û her wiha xwendekarên Hewlêrê jî beşdar bûn. Civîn seet 18:20'ê êvar bi dawî hat.

Dîktatorê Biçûk Kê Dixapîne!?

Sehab Xalidî

mencel_senger@yahoo.com

Mehmûd Ehmedînjad ku bona axavtina di Civata Giştî a Saziya Neteweyên Yekbûyî de seredana "New York"ê kiribû, roja duşembî, 24.09.2007'an li zanîngeha Kolombiyayê de berhev bû da ku li ser helwêstên dirust û mentiqî ên Komara Îslamî a Îranê û herweha li ser azadî, demokrasî û azadiya ramanê di Îranê de peyvekê pêşkêş bike!?


Lê berî vê ku Ehmedînjad bihê zanîngeha Kolombiyayê, xwendekarên vê zanîngehê nerazîbûna xwe eyan kirin û ragehandin ku nabe ew serkomarê ku bi êşkera Hulukastê ret dike û daxwaza mihkirina Îsrailê li ser xerîteya cihanê dike, bihête vê zanîngehê û hitbara zanîngeha me bibe jêr pirsyarê. Lê serbarê dijberiya xwendekaran berpîrsê zanîngehê ragehand, bila Ehmedînjad bihê, emê pîrsên zehmet û giring lê bikin. Helbet Ehmedînjad daxwaza seredana ciyê bûyera 11^ê Septamberê jî kiribû, lê Şaredarê Nîyoyorkê ragehand: Hatina Ehmedînjad bo vira bê hurmetî bi xelkê vî welatî ye. Çawan dibe yê ku piştewaniyê ji terorîzmê dîkin seredana ciyê vê bûyerê bikin? Ev biryara di demekê de bû ku Şaredarê Nîyoyorkê îzna malbatên qurbanîyên bûyera teqîna Navenda Cihûyan li paytexta Arjantînê de dabû ku bi serkomarê xwe re seredana ciyê vê bûyerê bikin û bona hevderdiya bi malbatên qurbanîyên bûyera 11^ê Septamberê, qevdikên gula li ser ciyê vê bûyerê danên.

Berî vê ku Ehmedînjad axavtina xwe li wir dest pê bike, berpîrsê zanîngeha Kolombiyayê çû pişt tiribonê û bi vî awayî Ehmedînjad bi beşdarbûyîyan da naskirin. "Ehmedînjad hulukastê ret dike û daxwaza mihkirina Îsrailê li ser xerîteya cihanê dike. Azadiya ramanê di Îranê de tune ye, mafê jinan tê bînpêkirin".

Piştî axavtina "Lî Balîncêr" berpîrsê zanîngehê, Ehmedînjad çû pişt tiribonê. Dîsan jî weke hemû carê bas ji azadiya ramanê di Îranê de kir. Herweha got ku ez li bûyera Hulukastê bi şik û guman im. Ehmedînjad herweha di bersîva nûçegihanekî de derheq birêveçûna hukmê îdamê di Îranê de gellek bê şermane got: Di welatê me de tawanbar ji rêya bidarvekirinê ve tene îdamkirin, lê di welatê we de (merema wî Amrîka bû) xelk bi gazê an jî bi lédana ampûla hewayê tene îdamkirin. Herweha derheq derkirina hukmê îdamê bo du rojnamevanên Kurd got ku haya min ji tiştêkî weha tune ye.

Ehmedînjad di demekê de bas ji azadiya ramanê û azadiya kêmanîyên mesebî di Îranê de dike ku rojnamevan, xwendekar, kedkar û mamostayên xwendegehan seba eyankirina bîr û baweriyên xwe, yan

daxwaza zêdekirina heqdestê xwe û rexnegirtina ji hikûmetê dikevîne jêr îşkenceyên herî hovane ên sedsala navînî. Ehmedînjad ku bas li rêzgirtina ji mafê mirovan dike, her tenê di heyamê mehekî de 41 kes bi destê karbidestên dewleta vî serkomarê adil, mirovdost û xwedîman! hatine îdamkirin, bi bêy vê yekê ku ew kesana di dadgehekî bêalî û serbixwe de hatibne dadgehîkirin, yan mafê girtina parêzeran ji xwe re hebûbin. Ji bîra me neçe ku di dema şerê Îran û Îraqê de bi hezaran kesî ku seba eyankirina bîr û baweriyên xwe hatibûne girtin, her piştî bidawîhatina vî şerî, bi awayên herî hovane



Axavtina Ehmedînjad di Neteweyên Yekbûyî de ne tenê alîkarî bi kiriza ku Komara Îslamî ya Îran di qada navneteweyî de tê ketiye nekîr Belkî rewşa rejîmê aloztir kir...

hatne îşkence û îdamkirin. Ew kesên îdamkirî herweha di gorên bikom de dihatne veşartin, û navê ciyê veşartina wan terman jî danîne "Le'inet Abad". Ayetullah Muntezîrî di pirtûka bîranînên xwe de dinivîse: Di nava girtiyên li girtîgeha Êvînê de, gellek keç jî hebûn. Min vî çaxî gote Xumeynî ku îdama wan keçan li gora Ola Îslamê ne dirust e. Lê her piştî vê rexneya min, karbidestên hikûmetî di girtîgehê de destdirêjîya cînsî kiribûne ser wan keçan da ku bibne jin, û îdama wan li gora Ola Îslamê dirust be û piştê hemû gullebaran kiribûn!?. Belê Ehmedînjad jî azadiya ramanê ji wan erbabên xwe ve hîn bûye, ku wisa bû mirov çî çavnihêriyek ji Ehmedînjad û kirêgirtiyên din hebe.

Herweha di Îranê de serbarê vê yekê ku peyrewên kêmanîyên mesebî bi tundî tene perçiqandin, lê peyrewên mesebê Behayî ne tenê bi fermî nahêne nasîn, belkî ji çûna bo zanîngehan jî bêpar in. Li gora serhejmarîyekê ku ji aliyê nivîsingeha Civaka Navneteweyî a Behayîyan ve belav bûye, di sala 2007'an de, nêzî 369 Behayîyan di ciyên cur bi cur ên Îranê de mafê çûna bo zanîngehan û navendên Perwerdehiya Bilind hebûne ku bi sebebê Behayîbûna wan pêşiya navnivîsandina 191 kesî hatiye girtin. Herweha 70 xwendekar jî ku piştî navnûsiyê û di dema xwendinê de Behayîbûna wan êşkera bûye, li zanîngehan hatine derkirin. Pejirandiya (musewiba)

pêşgirtina ji çûna Behayîyan bo zanîngehan di berrav 25.02.1991'an de ji aliyê Civata Bilind a Şoreşa Çandî ve hatiye derkirin. Di benda 3^ê ya vê pejirandiyê de hatiye: Divêt pêşiya navnûsiya Behayîyan li zanîngehan de bê girtin. Heke Behayîbûna xwendekarekî/ê di dema xwendinê de jî êşkera be, divêt pêşiya xwendina wan bihê girtin.

Ew herweha dibêje ku di Îranê de azadiya takekesî heye û jin jî xwediyê gişt mafekê ne. Lê bas ji vê yekê nake ku wan di gaweke nû de dest bi avakirina "Polîsê Emniyeta Exlaqî" kiriyê û polisê bi nav Ewlekariya Exlaqî, her pêka serhejmariya wan bixwe heya niha karîne ku nêzî 150.000 kesî li seranserî welat de rapêçî girtîgehan bikin. Helbet hewce ye ku em vê yekê jî bêjin ku pênaseya bê exlaqiyê li cem wan eva ye ku jin divêt bi tevahî xwe dapoşin, û mêr jî nabe bi kincên balkêş û milkurt bigerin. Em dikarin bêjin berevajî welatên azad û demokratîk di Îranê de, tenê Xamineyî û Ehmedînjad serwer in, ne yasa!?

Ehmedînjad derheq bûyera Hulukastê jî dibêje ku divêt li serrast, an jî nerastbûyîna hulukastê lêkolînên zêdetir bêne kirin. Helbet Ehmedînjad Hulukastê bi tevahî ret dike, lê vê carê eva bi qazancê wî bû ku bi vî awayî pipeyive. Ehmedînjad di demekê de bas li lêkolînên pitir li ser vê bûyerê dike ku bi dehan carî dimenên vê bûyerê li torên televizyonî ên Îranê de belav bûne.

Ehmedînjad herweha Îsrailê bi rejîmekî dagirkar dizane û daxwaza rakirina vê li ser topa erdê dike. Ehmedînjad divêt bizane ku xelkê Felestîne Mehmed Ebbas wekî serokê herêma xwe hilbijartine, ne Ehmedînjad. Xelkê Felestîne bi serokatiya Mehmed Ebbas dikarin li derheq çarenûsa xwe de bifikirin û biryaran bidin, ne Ehmedînjadê ku ji alîkî ve xwe bi dilsojê xelkê Felestîne dihesibîne û ji alîkî din ve jî bi dana alîkariyên zaf ên malî û leşkerî bi Saziya Hemasê, vê saziyê dijberî Îsrailê weha tûj dike ku nabe heya hilweşandina Îsrailê desta ji xebatê bikêşin, û bi vî awayî bixwe mezintirîn asteng in li hember aştiya di navbera her du wlatan de. Herweha Ehmedînjad di demekê de bas ji nehêlana Îsrailê li ser xerîteya erdnîgariya cihanê dike ku welatên Erebbî bixwe hatine ser vê baweriyê ku dijberiya Îsrailê nekî. Şeş welatan di hinek waran de bi Îsrailê re têkilî hene, du welatan jî têkiliyên berdeham bi Îsrailê re hene.

Ku wisa bû ev hemû vir û derew, û gefên Ehmedînjad ne tenê temenê hikûmeta wî dirêj nakin, belku berev hiloşînê nêzîktir dîkin. Zalim qet sernakevin, renga bo heyamekî kurt an dirêj bikarin gelan biperçiqandin, lê dawiya temenê dîktatoran her şikest û têkçûn e û serkevtin ya azadîxwazên rastîn e. Lewra divêt Ehmedînjad jî ji vê yekê xatircem be ku qedera wî ji qedera dîktatorên mîna Hîtler, Mosolîni, Pînoşe, Seddam û Milfoviç baştir nabe.

Guhertinên Rûyekî Dê Turkiyê Ber Bi Kuderê Bibin?

Azad Kurdî
azadkurdî@hotmail.com

Li gorî qanûna bingehîn a Turkiyê, mafê perwerdehiya fermî tenê bi zimanê Turkî azad e û xwendin û nivîsandin bi zimanên din qedexeyê. Çi beriya hilbijartinan û çî piştî serkevtin di hilbijartinan de, rêberên AKP'ê soza pêkanîna guhertinan di yasayên Turkiyê de anîn rojevê.

Cemîl Çiçek, Cigirê Serok Wezîrê Turkiyê, roja 22'ê Îlona 2007'an, di daxuyaniyê çapemeniyê de xuya kir ku ji bilî 3 eslên yekem ên Zagona bingehîn a Turkiyê ku li ser sîstema Sekolarbûna wî welatî tekezê dikin, em dikarin hemû bendên din yê wê qanûnê biguherînin.

Çiçek demekê ev gotin anîn ziman ku rêveberên partiya desthilatdar (AKP) li ser pêkanîna reform û guhertinan di qanûna bingehîn a Turkiyê de civayan.

Di encama karê wê civînê, AKP'ê pêşniyara yasaya bingehîn a nû ya Turkiyê xiste rojevê ku têde bêy wê ku rasterast navek ji zimanê Kurdî hatibe birin, bi awayekî ne fermî perwerde bi zimanên xeyrî Turkî serbest îlan kiriye. Li gorî norm û pîrensîpên civakên demokratîk, pêkanîna guhertinan di hemû warên têkildar bi jiyana civakê û nemaze di warê yasa û qanûnan de, tiştê normal û xwezayî ye û dikare mekanîzmek ji bo geşkerin, pêşdeçûn û nûbûnê be. Lê di vê navberê de xala balkêş û ecêb ew awayê guhertinan in ku di welatên Rojhilata Navîn de bi giştî tê dîtin. Pêşniyasa qanûna bingehîn a nû ya dewleta Turkiyê, mînakê ji wan guhertinên rûyekî ye.

Her çiqas ji bo berhevkirina vê reşnîva nû a qanûna bingehîn a Turkiyê, ji pêşniyasa pêşniyarkirî a komek Parêzerên Turk û herwiha Yasaya bingehîn a Yekîtiya Ewropayê mifah hatiye standin, lê ji me re xuya dibe ku li benda derbarê azadiya nivîsîn û xwendin bi zimanê Kurdî, lîlî û nerohnî û ruha ret, înkarkirin û parêzkariyê tê de tê xuyakirin. Di pêşniyasa nû a dewleta AKP'ê de, navê perwerde û mafê xwendin û nivîsandin bi zimanê Kurdî bi fermî nahê anîn û ne jî rasterast tê baskirin. Ji ber ku pîrsa perwerdeyî û xwendin bi zimanê Kurdî bi awayekî rasterast bi doza neteweyî û beşek ji mafên gelê Kurd li Turkiyê têkildar e. Amadekarê pêşniyasa nû ji neanîna navê zimanê Kurdî weke zimanê neteweyê xwedî nasnameya xwe a taybet, xwe parastin û diparêzin û ew rastî zêdetir derdikeve holê ku derheq pîrsgirêka Kurd û mafên Kurdan li Turkiyê, hemû partî û aliyên dewletê bi hev re hevber û ra ne.

Di halekê de ku gellek karnas û pisporên warê siyasî du serkevtinê dî hev ên AKP'ê li hemberî hêzên Nasyonalîst, Artaşî û Çepên Nijadperest ên vî welat weke destpêka qonaxê nû a siyasî li Turkiyê dihesibînin, lê ev partî û rêveberên wê navêrin tevî eniya Nijadperest û birteng û înkara Kurdan rû bi rû bibin û di ceribîna nû a guhertinan de serkevtî derbas nebû? Ji sala 1982'an ve, tu guhertin di qanûna bingehîn a Turkiyê de çê nebûne û



piraniya pîrsgirêkên hundirîn û derve ku Turkiyê pêre dinale, ji van zagonên neguher çavkanî digire.

Li gorî ramanên Nijadperestane ên rayedarên Turkiyê, anîna berbas her cure maf û azadiyê neteweyî ji bo Kurdan bezandina hêlên sor ên vî welatî tînin hesabandin û ceza û tawan herî dijwar û giran li Turkiyê bo wan kesan tê diyarkirin. Eva di demekê de ye ku nifûsa neteweya Kurd li Turkiyê bêtirî 25 milyon kesan e û bînpêkirina maf û azadiyên Kurdan li Turkiyê berdeham dikeve ber rexneyên tund. Yekîtiya Ewropayê derbarê wergirtina Turkiyê ji bo endambûn di vî sazîyê de doza parastina mafên mirovî û demokratîk ên Kurdan dike û çaresernekirina pîrsa Kurd weke astengeke mezin a endambûna vî welatî dizane û ji berpirsiyarên Turkiyê re didin xuyakirin.

Îtirafkirina Erdoxan bi doza Kurd û hinek soz û cehd û bizavên rûyekî ên bi vî awayî, nikarin tu xizmetekê bi çareserkirina pîrsgirêka herî mezin a Turkiyê, yanî doza Kurd bikin. Girîng guherandina bîr û hizrên teng û nasyonalîstî ên eniya hêzên neteweyî û Artaşiyên wî welatî ye ku pêşiya tev pêvajoyê reformîstî li Turkiyê girtiye. Hêj pêşniyasa nû a dewleta desthilatdar a Turkiyê ji bo qanûna bingehîn a vî welatî bi tevahî pêşkêşî Parlemantoyê nehateyê kirin, demdest Deniz Baykalê Sekreterê CHP'ê helwesta xwe bi vî awayî da zanîn ku azadiya xwendin û nivîsandin bi zimanê Kurdî dibe sedema parvebûna Turkiyê! û ev welate dê rastî qedereke weke Yûgoslavyayê bihê. Herwiha berpirsiyarên Artaşê ji bi tundî dijberiya xwe di vî warî de dan xuyakirin.

Gelo bi vî lojîk û mentelîtayê, Turkiye dê çawa bikare bi van cure gavên rûyekî guhertinan di çarçoveya siyaseta xwe de pêk bîne û pêşde biçê, di çaxekê de ku Turkiye bi hemû hêz û şiyana xwe di hewilîne bibe endamê YE'ê, Yekîtiya Ewropayê jî daxwaza pêkanîna reform û guhertinên kûr û berfireh di asta sîstem, qanûn û zagonên Turkiyê di vî welatî de ye. Take rêya pêwîst, guherîna bîr û ramanên hêzên rêveberên Turkiyê ên bîrtesk û nijadperest ên wî welatî ye ku astenga herî mezin li ser rêya çareserîya demokratîk û aştiyan û hemdemî a pîrsgirêkên Turkiyê ye.

Di serdemê îro de ku hemû tişt mijûl e ser û bin dibe û ser li nû darêtin û tev çarçove û rêbazên kevn û paşvero şêl û awayên nû û nûjen bi xwe ve digirin, hewce dike desthilatdarên Turkiyê jî çî din bi vî awayî tevî Kurdan û pîrsgirêka Kurd tevegerin, ji ber ku doza Kurd yê bûye pîrsêke navneteweyî û

gavên rûyekî ên Turkiyê ku heya niha jî înkara hebûna 25 milyon Kurdan di vî welatî de dikin, nikarin bibin alîkar û pîrsa demokrasiyê li Turkiyê çareser nakin.

Du Xebatkarên Kurd Hatî Şehîdkirin

Li gorî agahiyên Navenda Nûçeyan ya PDK Îranê, roja çarşem, 10.10.2007'an, du tekoşerên Kurd û endamên nepenî yê PDK Îranê, bi navên **Kiyûmers** û **Nadir Mihemedî**, bi buxtana kuştina Femanderekî xwefiroş û bikujê du şehîdên Kurd û Pêşmergeyên PDK Îranê bi navê **Hejar Rizayî** û **Semsedîn Rostemî** ji aliyê bikujêna rejîma Îslamî a Îranê ve di girtîgehê Şaredariya Sine de hatin lidarvekirin.

Şehîd Kiyûmers heya demên dawîya jiyana, dirûsmên **bijî PDK Îranê û silav li Dr. Qasimlo** didan. Şehîdbûna van du xebatkar û qehremanan, kovanekî zaf xiste nava dilê xelkê bajarê Sine û bi taybetî xelkê gundê Şiyane.

Em bi vî hincetê serxweşiyê ji malbat û kes û karên şehîd Kiyûmers û Nadir Mihemedî dikin û xwe di xem û kovanên wan de beşdar dizanin.

Riha wan şad û rêya wan pir rêvîng be.

Wexera Dawiyê Ya Pêşmergeyê Kevnarê PDK Îranê

Roja 18.07.1386(10.10.2007'an, **Mam Tahir Rehmanî**, Pêşmergeyê kevnar ê PDK Îranê bi sedema nexweşiyê çû ber dilovaniya xwe. Mam Tahir xelkê gundê "Derehecîc"



a herêma Hewramanê bû ku piraniya temenê teji fexr û şanazî e xwe di rêya bidestveanîna mafên gelê Kurd de, bidawî anî.

Mam Tahir di salên 1342 – 1343(1963 – 1964'an de, tevî PDK Îranê pêwendî girt û weke endamê nepenî li devera Nodşe a Hewramanê, dest avête xebatê. Hêjayî gotinê ye ku Mam Tahir weke Pêşmerge di şoreşa Eylolê de jî beşdarî kiriye.

Piştî şoreşa gelên Îranê û îlankirina xebata eşkere ji aliyê PDK Îranê ve, Mam Tahir tevî take kurê xwe di nava refên partyê de xebata xwe destpê kiriye û di hemaya 28 salan xebata PDK Îranê li dijî rejîma Komara Îslamî a Îranê, weke Pêşmergeyê biemeg erkên partyê bicî dianîn.

Bi hinceta wexera dawiyê a Mam Tahir, em serxweşiyê ji malbat û hevlên Mam Tahir dikin û xwe di kul û kovanên wan de bi şîrîk dizanin.



MILETÊ KURD LI SÛRIYA Û PIROJEYA HEJMARTINA 1962'AN

ELÎ ŞEMDÎN

Silêmaniyê - 05.10.2007

Pîştî herifandina Împiratoriya Osmanî û pêkhatina peyman (Saykis-Pîko) ku Kurdistan da

parçekirin, ji wê demê ve parçek ji miletê Kurd kete ber sînorê dewleta Sûriyê de û Kurd bûne hemwelatîyên Sûrî û nasname wê wergirtin, lê mixabin rêjîmên Sûrî yê şovîni hertim Kurd xerîb didîtin û digotin ew ji derve hatine û dixwazin welat parçe bikin û Îsraîla duyem ava bikin û digotin Kurd xeter in li ser ewlekariya welêt, û li ser bingeha vê nêrîna şovîni û nijadperestî ya partiya Bees ji 1946'an ve her xwestiyê vî miletî ji kok ve bide birîn û barkirin da ku demografiya herêmên Kurdî li Sûriyê (Koban, Efrîn û Cezîrê) bide guhertin, bi riya pêkanîna zincîreke dirêj ji pirojeyên rûş ku dane meşandin dijî netewa Kurd li Sûriyê. Di pêşiya wan pirojeyan de, piroja **Hejmartina 1962'an** ku îsal 45 sal li ser pêkanîna wê re derbas dibin.

Ne veşartiyê ku herêma Cezîrê (Parêzgeha Heskê) mezintirîn parêzgeha Sûriyê ye, bi piraniya xelkê xwe ve **80%** Kurd in û dikeve bakur û bareşê Sûriyê de li ser sînorê Turkiye û Îraqê. Gelleki zengîn e bi petrol û genim û pembûyê xwe û ji ber vê yekê şovîniyên Ereb di desthilatên Sûriyê de her û her xwestine xelkê vê herêmê yê Kurd bidin guhertin û barkirin û xelkên ereb têxin şûna wan, lewma ew nezan û birçî kirine û zulm û zor li wan dijwar kirine da ku wan bidin barkirin. Di vê derbarê de, sala 1961'an Efserekî ewlekariyê bi navê **Mihemed Teleb Hilal** li Cezîrê hebû, lêkolînek nivîsîbû li ser herêma Cezîrê di warên: siyasî, civakî û aborî de. Di nivîsa han de **12** pêşniyar pêşkêşî desthilata xwe kiribûn ku çawa Kurdan bide helandin, erebkirin, birçîkirin, barkirin û herweha sitandina nasnamê jî yek ji wan pêşniyarên wî yê rûş bû.

Rêjîma Sûriya şovîni di 05.10.1962'an de, li Cezîrî bédeng hejmartinek awarte û taybet li herêma Cezîrê pêk anî û bêtir ji **120 000** hemwelatîyên Kurd bê regezname hiştibûn û nasname wan ji wan kişandibûn, û bi yek imzê ew di welatê wan de xerîb hiştibûn, tenê ji ber ku bi netewa xwe Kurd bûn û bi vê pîlanê deriyê jiyane li ber wan hate girtin; bê kar û xwendin, bê qad, bê dekomentên hemwelatîyan ku bikaribin derkevin derevî welat yan li otêlan rakevin yan jî mal û milk û mewdanên xwe li ser navê xwe binivîsin û tapo bikin. Her wiha jî nikarin jin û zarokên xwe jî bi rengekî asayî li ser xwe binivîsin û ji dengdan û hilibjartinên perlemanî dûr man

û mafê dengdanê bi wan re tune ye.

Bi rastî div, bê gotin ku ev pirsgirêk roj bi roj xerab û diwartir dibe û jiyana rojane ya Kurdên bênasname asê û nexwestir dibe û jimara wan sal bi sal pirtir dibe. Heta ku îro hejmarê Kurdên bênasname gihiştîye nêzîka nîv milyonî. Di van 45 salan de, ji ber ku zarokên kesên bênasname, ew jî bênasname dimînin û di vî warî de pêwîst e bihê şirovekirin ku ev kes du nîfş in, yek ji wan di 1962'an de nasname ji wan hatiye sitandin, ew bi navê **Ecanibên Heskê** tên binavkirin, navê wan di lîsta bênasmanan de heye û dewlet dukomenteke sor dide wan tenê ji bo pênasînê. Beşa din ewên ku nasname jî ji wan hatiye sitandin û dukument jî ji wan re tune ye, ew bi navê **Mektûman** tene naskirin.

Nahê veşartin ku li dijî vê pirojeya xerab û kirêt tevgera Kurdî li Sûriyê xebatek bêrawestan berdewam kiriye ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê û vegeandina nasnamê li xwediyên wê ku bikaribin jiyana xwe bê astengî berdewam bikin, û tevgerê ev siyaseta şovîni li ber raya giştî bi berdewamî pirotesto û tazî kiriyê û li cem hêz û rêxistinên mafê mirov û yê berevaniya demokrasiyê dikin, çî yê Sûrî û çî jî yê navdewletî û ji wan hêzan xwestiyê ku piştigiriya neteweya Kurd bikin li dijî vê zincîra dirêj ji pirojeyên şovîni yê ku partiya Bees a Sûriyê bi xurtî li herêmên Kurdî li Sûriyê dide meşandin û pêkanîna, lê mixabin heta îro dengê van hêzan ji aliyê desthilata Sûrî ve nehatiye bihîstin, ku çavê xwe ji vê rastiyê digre û guhê xwe jî digre li ber qîrîna wan kesên bîndest ku doza mafê xwe yê mirovî yê herî piçûk dikin, mafê nasnamê. Di van 45 salan de, tenê sozên derew ji desthilata rêjîmê bihîstine û Serok Komarê Sûriyê jî çend caran gotiya rast e, ev piroje pîs e û soz daye ku demek nêzîk wê çareser bike. Cara dawî, mehekê berî niha di Parlemanê de gotiye, lê ewî jî ta niha sozên xwe bicî nekiriye.

Di vê bibîranînê de, bîranîna salvegera pêkanîna hejmartina awarte ku di 1962'an de li parêzgeha Heskê li dijî Kurdan hatiye pêkanîna ku di seranserê van 45 salan de berdewam e, em dubare vê piroja rûş pirotesto dikin û banga raya giştî dikin ku li dijî bisekine û zorê li rêjîma Sûrî bikin ku vê pirsgirêkê çareser bike û nasname wan li wan vegeandine, ku ew jî wek hemwelatîyên din jiyana xwe di welatê xwe de bê astengî berdewam bikin ..

Li Qamişloyê Serjmartina Awarte Hate Protestokirin



► Bi helkefta 45-saliya Serjmartina Awarte li Kurdistanê Suriyê, roja 05.10.2007'an, li Qamişloyê hejmareke mezin ji welatîyên kurd xwenîşandaneke protestoyê ya aştîyane li dar xist. Piraniya kesên amade ji Kurdên bînfîs bûn, ku goriyên siyaseta rêjîma Sûriyê ya stendina nasnameyên Sûriyê ji welatîyên kurd in. Xwepêşanderan ji rêjîma Sûriyê doza vegeandina nasnameyên Sûriyê bo bêtirî ji 300 hezar welatîyên kurd kir. Wan herweha doza "çareserkirineke dadmendyane" ji Pîrsa Kurdî li Sûriyê re kir. Sê partiyên Kurdî bangî ve çalakîyê kiribûn. Îroj berî 45 salan, di 05.10.1962'an de, li hemû bajarên kurdî li parêzgeha Hisîçayê nasnameyên Sûrî ji dora 150 hezar welatîyên kurd hatin stendin. Ev kes ta roja îroj bê nasname ne û ji gellek mafên welatîyan bêpar mane. Hejmarê mezin ji wan welatîyan wekî welatîyên "ejnebî", ango "biyanî", ne. Hinên dî jî "mektum" in. Kesên "mektum" zarokên an dêyek kurd a "ejnebî" yan jî bavek kurd ê "ejnebî" ne. Rêjîma Sûriyê û serokê wê Beşar el-Esed gellek caran soza çareserkirina vê pîrsê dane, lê ta niha sozên xwe bi cî neanîne. Partiyên "Komîteya Tensîqê ya Kurdî", ku ji Partiya Yekîtiya ya Kurd li Sûriyê, Partiya Azadî ya Kurd li Sûriyê û Şerpeîla Pêşerojê ya Kurd li Sûriyê pêk tê, bangî xwenîşandana li Qamişloyê kiribûn. Di vê çalakîyê de gelek dirûşm hatibûn hildan û bangkirin, hin ji wan ev bûn:

- Ber bi Sûriyek demokratyane û bê cudabûna regezperest ve;
- Divê Girtiyên siyasî di zindanên Sûriyê de serbest bêne berdan;
- Divê Serjmartina Awarte li Cezîrê bête rakirin
- Divê Kembera Erebî li Cezîrê û bi taybetî li Dêrikê û Serê Kaniyê û herêmên kurdî yê dî bête rakirin;
- Bijî Yekîtiya gelê kurd.

Partiyên kurdî yê dî di daxuyaniyan de Serjmartina Awarte protesto kir û ji rêjîma Sûriyê doza bidawînanê ve siyaseta û vegeandina nasnameyan ji bo welatîyên kurd kir.

Nûçe ji "amude.com" hatiye wergirtin

10'ê Octobrê Û Domkirina Îdamê Li Îranê

Hemîd Muxtarî

Roja 10'ê Çiriyaya Pêşîn, salvegera xebat li dijî îdamê ye. Îro rojê di gellek welatan de biryara daliqandinê hatiye rakirin û welat ber bi demokrasîyê diçin. Lê mixabin îdamkirina mirovan bixasmanî zarokên bin 18 salîyê de heya niha jî di hin welatan de dom dike.

Li gor serhejmariya sala 2006'an, tenê di 25 welatan de cezayê îdamê birêve çûye û %91 ji van daliqandinan tenê di 6 welatan de hatiye encamdan, ku Îran yek ji wan welatan e.

Diyare ne tenê Îran di nava wan welatan de ye, belkî îsal cezayên lidarvekirinê di Îranê bin desthilatdariya rejîma Komara Îslamî de zêdebûnek berçav bi xwe ve dîtiye. Bêtir ji 210 kes di dema wan 9 mehên borî de hatine daliqandin. Di meha borî de di doma rojekê de 21 kes li ber çavên xelkê, di şeqam û cihên giştî de hatine darvekirin.

Herçend ku rejîma Îranê yek ji wan rejîman e ku dijberiya xwe tevî dana biryara îdamê derheq zarokên jêr 18 salîyê de nişan dide û Carnameya mafê zarokan pejirandiye, lê heta rehmê bi wan jî nake û mixabin em dibînin ku di girtîgehên Komara Îslamî ya Îranê de zaf zarokên bin 18 salîyê de hene ku bi sûtçên cur bi cur cezaya îdamê bi ser wan de hatiye sepanandin û li benda wê rojê ne ku bibin 18 salî û herin bin dara îdamê. Rojek ku di piraniya welatên pêşkevî û demokrat yê cihanê de zarok bona girtina cejna ji



dayîkbûna xwe û vexwendina hevalên xwe û derbaskirina rojek pir xweş benda vê rojê dikişînin. Lê zarokên Îranê ên di girtîgehê de berevajî vê yekê ne, ew ji rojeke han

ditirsin. Ji ber ku roja dawîya jiyana wan e û li cihê girtina cejnê divê xatira xwe ji dayîk û bav, xûşk û bira, kes û kar û hevalên xwe bixwaze û herin bin darê îdamê.

Rejîma Îslamî a Îranê bi birêvebirina siyaseta kuştina bi enqest û girtina canê zarokên xelkê, bi hezaran malbatan xembar û reşpoş dike û zêdetir raya giştî a cihanê bi dijî xwe han dide.

Di rastî de piraniya ew kesên ku di bin desthilatdariya rejîma Komara Îslamî de tînd daliqandin, mirovên azadîxwaz, xebatkar, rewşenbîr û welatperwer in ku rejîma Îranê wan weke mirovên rezil û bêbiha binav dike, da ku hem bikaribe neyarên xwe yê siyasî ji nav bibe û tirs û xofê bixwe di nava dilê xelkê Îranê û hem bi xapandina raya giştî ya cihanê

wiha bide nişandan ku di Îranê de neyarên siyasî tune û xelkê Îranê azad in û hemû rejîma Komara Îslamî ya Îranê dipejirînin.

Her di vê derheqê de, roja 24'ê Îlona 2007'an de, **Mehmûd Ehedînijad**, Serok Komarê rejîma Komara Îslamî a Îranê, di Konferansekê Çapemeniyê de ku li ser daxwaza "KLOP PIRS" ya Amerîkayê li bajarê "NEW YORK" ê hate lidarxistin, got: "xelkê Îranê xelkê herî azad yê cihanê ye". Lê bi rastî wiha ye? Xelkê Îranê azad e? Gelo heta çawaniya lixwekirinê ji bo jin û mêran ji aliyê rejîma Komara Îslamî tê diyarîkirin. Roj nîne ku kes seba eyankirina raya xwe nehê daliqandin yan nehê girtin. Her li dirêjahiya salekê pitir ji 73 rojnamevan di Îranê de hatine girtin û pitir ji 20 weşan hatine daxistin, bi sedan kes ji xelkê sivil li ber çavên xelkê hatine daliqandin. Her niha 2 ciwanên rojnamevan yê Kurd bi navên "**Hîwa Botîmar**" û "**Ednan Hesenpûr**" bi buxtana "Moharibe" (dijberîkirin bi xwedê re), ji aliyê Dadgeha Şoreşa Merîwanê, bi cezayê îdamê hatine mehkûmkirin û niha di girtîgeha bajarê Sine de li benda birêveçûna biryara îdamê ne û rewşa ruhî û cismî ya wan pirr xirab û dijwar e.

Di rastî de cezaya van du ciwanan tenê eyankirina raya wan bû ku ew tûşî cezaya han ya giran kirin. Eva ew azadiya ye ku birêz Ehedînejad qala vê dike!

Em carek din daxwazê ji hemû mirovên azadîxwaz û mirovhez û sazîyên mafê mirovan û "NGO" yê çeleng di vê warê de dikin ku bi xistina zext û givaşan bo ser rejîmê canê van du ciwan û sedan ciwanên din ji destê rejîma Komara Îslamî ya Îranê de rizgar bikin û di pêşveçûna pirosesa demokrasî di Îranê de piştevaniyê ji neteweyên azadîxwaz yê Îranê bikin.

Daxuyaniya Çapemeniyê A RMMK:

Bi Hinceta 10'ê Oktoberê, Roja Cihanî A Xebat Li Dijî Îdamê

► Di halekê de ku asta birêveçûna îdamê di piraniya welatên cihanê de jêrde hatiye û hejmara welatên ku biryara îdamê di yasayên xwe de nahêlin zêde dibin, mixabin di Îranê de bi terzeke cihê nigeraniyê biryara daliqandinê tê birêvebirin. Bi awayekê ku aliyê kêr 210 kes tenê di doma 10 mehan de bi sedemên cur bi cur hatine îdamkirin û hejmareke zaf jî li benda birêveçûna biryara îdamê ne. Di vê navberê de her çiqas ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê Carnameya Mafê Zarokan di sala 1994'an, de îmtza kiriye, lê rejîma Îslamî a Îranê derheq îdamkirina zarokan di cihanê de xwediyê pileya yekem e û pitir ji 70 zarok di girtîgehên rejîma Îslamî ya Îranê de li benda lidarvekirinê ne.

Girtiyên din ku bi cezaya îdamê tînd mehkûmkirin, xwediyê sûtçên cur bi cur in. Di mehên borî de piştî birêveçûna gelaleya parastina ewlehiya civakî di Îranê de, dehan kes ji xelkê Îranê li bin navê mirovên rezil û bêbiha li ber çavên xelkê hatin daliqandin. Ew kes ji hebûna Parêzeran



bêpar bûn û dadgehên neeskere di heyameke kurt de û bê vê çendê ku li îzn û derfetên berevanîkirinê bide kesên sûtçbar, biryara îdamkirina wan derxist û tê gotin ku kesên sûtçbar berî daliqandinê bi terzeke nemirovane hatine îşkencekirin.

Ji aliyekî din ve li Kurdistanê, Dadgeha Şoreş ya bajarê Merîwanê **Ednan**

Hesenpûr û **Hîwa Botîmar**, du hevvelatîyên Merîwanî, bi buxtana "Muharibe" (dijberî tevî xwedê) bi îdamê mehkûm kiriye û niha dosya wan bo Dadgeha Bilind ya Îranê hatiye şandin da ku biryara dawiyê li ser vê biryarê bê dan.

Rêxistina Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê di Roja Cihanî a Xebat Li Dijî Îdamê, bi tundî dijberiya xwe tevî birêveçûna biryara daliqandinê êskere dike û bi giştî îdamkirina xelkê bi her sûtçekê û di her temenekê de be mehkûm dike û bi kiryareke ne mirovane dihesibîne.

Herwiha em daxwazkarê ji holê rakirina biryara îdamê derheq Ednan Hesenpûr û Hîwa Botîmar in ku niha di girtîgeha bajarê Sine de ne.

Em daxwazê ji Dezgeha Dadê ya Komara Îslamî ya Îranê dikin ku di dema herî zû de pêşî ji birêveçûna biryara îdamê di Îranê de bigire û bi rakirina biryara han di yasayên cezayên kesên sûtçbar de, rêz û hurmetê ji bo mafê mirovan û Danezana Gerdûnî ya Mafê Mirovan bigirin.

Rêxistina Parastina Mafên Mirovan li Kurdistanê
10.10.2007

Rapora Sala 2007'an Ya Îdamê Di Îranê De



nûçegehnan, rojname, malperên nûçegehnanî yê cur bi cur di hundirê Îranê û herwiha hejmarek ji çavkaniyên derveyî welat e. Bi li berçavgirtina sansorên heyî li ser nûçeyan û jêderên hundirê Îranê, nûçeyên derheq kesên daliqî di Îranê de nahên weşandin yan bi kêmi tên weşandin, lewra rapora han tenê beşek ji wan kesên daliqî yan li benda îdamê di

Bi hinceta 10'ê "Octobêr"ê Roja cihanî a xebat li dijî îdamê û eşkerekirina ew daliqandin û

binpêkirina berfireh ya mafê mirovan di Îranê de, çalakên Îranê yê Parêzerên Mafê Mirovan li Ewropa û Amerîkaya Bakûr, rapora xwe ya salane derheq rewşa îdamkirinê di Îranê de bi awayê jêrîn pêşkêşî raya giştî dike:

Rapora han nav û nîşanên wan kesan bi xwe ve digire ku li heyamê Çiriya Pêşîn a sala 2006'an, heya Îlona 2007'an, di Îranê de yan bi îdamê hatine mehkûmkirin yan hatine daliqandin. Agahiyên hatî di vê raporê de bi giştî li gor agahiyên

Îranê de bi xwe ve girtiye.

Rapora berbest du listeyan bixwe ve digire.

1-Listeya kesên îsambûyî

2-Listeya kesên li benda birêveçûna biryara îdamê ne

Listeya hejmara yek:

Li gor listeya han bi giştî biryara li darvekirina 265 kesan di heyama 10 mehên borî de hatiye birêvebirin ku li gor sala borî %140 jorde çûye.

-3 kes ji wan jin in.

-34 kes ji wan girtiyên siyasî bûne ku hejmara wan 6 hemberî sala borî ye.

-Îdamkirina li ber çavê xelkê, li gor sala borî 2 qat zêde bûye.

-Yek ji kesên mehkûmbûyî bi îdamê li ber çavên xelkê hatiye barbarankirin.

-Temenê 77 kes ji wan mirovên lidarvekirî ku di vê raporê de hatiye, bi vî awayî ye: 47 kes ji wan 30 salî bûne û 30 kes ji wan temenê jordeyî 30 saliyê hebûne. Kesê îdambûyî yê herî kal û bi temen, 65 salî bûye.

-Agahî derheq 57 kes ji wan, bi terzekî nekemilî berdest e.

Listeya hejmar du:

Li gor listeya han, 218 kes li benda lidarvekirinê ne. Herwiha li gor agahiyên ketî berdest, biryara daliqandinê 39 kesên din ku di salên borî de biryara îdamê derheq wan hatibû dan, carek din ji aliyê Dîwana Dada Bilind ya Îranê hate pejirandin. Hêjayê gotinê ye ku navê wan kesan di vê listeyê de berdest nine.

Hejmara dana biryara îdamê li gor sala borî %60 jorde çûye.

-11 kes bi kevirbaranê (recimkirinê) hatine mehkûmkirin.

-26 kes ji wan jin in.

-5 kes girtiyên siyasî ne.

-Li gor agahiyên berdest, temenê 98 kes ji wan bi vî awayî ye:

4 kes ji wan jêr 18 saliyê ne, 63 kes di nava 18 heya 30 saliyê de ne û 31 kes ji wan jordeyî 30 saliyê ne. Hêjayê gotinê ye ku 7 kes ji wan li dema encamdana cezayê, di bin 18 saliyê de bûne.

-Agahî derheq 76 kes ji wan, bi awayekî nekemilî ye.

Çalakên Îranê yê Parêzerê Mafê Mirovan li Ewropa û Amerîkaya Bakûr 10.10.2007

Xelata Azadiya Rojnamevaniyê A Îtaliyayê Bi Her Du Rojnamevanên Girtî Ên Kurd Li Kurdistana Rohilatê Hate Dayîn

Rêxistina Ragihandin û Ewlehiya Rojnamevanan li



Îtaliyayê, ragehand ku xelata îsal a **Azadiya Rojnamevaniyê a Îtaliyayê** bi her du rojnamevanên girtî ên Kurdistana Rohilat, bi navên Ednan Hesênî û Hîwa Bitîmar tê dan ku çend mehan berî niha rejîma Komara Îslamî a Îranê biryara daliqandinê bi ser wan de sepandiye.

Xelata Azadiya Rojnamevanî a Îtaliyayê ku ji bo rojnamevanên çalak di warê civakî û azadiya raderbirinê hatiye diyarkirin, sala borî 2 rojnamevanên Kurd û Aşûrî bûne xwediyê xelata han.

Li gor agahiyên "Radio Farda"ê, qirar e ev xelata han di meha Çiriya Paşîn, li binkeya Şaredariya bajarê Siyena a Îtaliyayê ji malbatên wan du

rojnamevanan re were pêşkêşkirin.

Îstivano Maçêlî, avaker û birêveberê rêxistina han, derheq dana vê xelatê got: "Sedema sereke ya hîlbijartina van du kesan ji bo xelata îsla ya Azadiya Rojnamevaniyê a Îtaliyayê, dijberiya me tevî biryara lidarvekirina wan du rojnamevanan û piştevanîkirin ji gelê Kurd li Kurdistana Rohilat e ku herdem tî tepeserkirin. Navhatî her wiha qala vê çendê jî kir ku ew dixwazin hevalbendiya xwe tevî Kurdan xurtir û berfirehtir bikin.

Endameke Kampayna Yek Milyon Îmzayan Li Kurdistana Hate Girtin

Li gor rapora Nûçegehnanê Rêxistina Parastina Mafê Mirovan li Kurdistana, sibêdeya roja sêşem, 09.10.2007'an, xatûna **Ronak Sefarzade**, çalakê mafê jinan û yek ji endamên Kampayna Yek Milyon Îmzayan bona guhertina yasayan bingeîn a teji ferq û cudahî ya Komara Îslamî ya Îranê li bajarê Sine hate girtin. Hêzên Ewlekarî yê rejîma



Ronak Sefarzade, jina Kurd a çalaka mafê jinan li Kurdistana

Komara Îslamî ya Îranê piştî lêgerîna mala Ronak Sefarzade û komkirina hemû îmzayên kampanyayê û dest bi ser de girtina "Hard" a kumputerê, navhatî ber bi îdareya Ewlekariya bajarê Sine birin û niha li wir hatiye binçavkirin.

Hêzên Ewlekariyê bê nîşandana tu biryarekê, çûne nava mala wê û bi terzekî xirab û bêhurmetanê tevî malbatê wê tevgeriyan. Malbata Ronak Sefarzade tu zanyariyek li ser rewşa wê tu nin e.

REWŞ

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Rewşa mirovahiya îroyîn dişibe rewşa kesên ku di ser pira siratê re derbas dibin e.

Agirî şerê ku îro bi çarhêl û bêeman xwe li dora mirovahiya cihanê rapêçaye, wekî agirî dojecha dadayî yê ku di bin pira siratê de gur û geş dibe. Wekî ku tê zanîn li gorî bîr û baweriyên olî, dê pira siratê, roja meşherê ji bo hin mirovan bibe wekî balafirgeheke berfireh û dorhêl; û ji bo hin mirovan jî bibe wekî devê şûrekê ku bi qasî mûyekî zirav û her wiha mîna gûzanekê tûj û seqakirî ye. Tê gotin ku dê wê rojê kesên qenc û bawermend, wekî siwarên hespên rewan li bayê bezê, mîna berqtavên biharê di ser wê pirê re biqevizin; bihêşayî derbas bibin û reha bibin. Belê dê kesên xerab û tawanbar jî li ser devê wî şûrê ku mû diqelişe, bimeşin. Ji ber tawanbariya wan dê ew kes geh bikevin vî aliyê dojehê û geh jî aliyê din. Divê Xwedêgiravî bi ketin û rabûna wan re dê leymanên êgir ên wekî zihayan(ejderha) wan daqurtînin; wan bihêrin û peyre wan bera bidin binê newalên dojehê yên reş û tarî û bêbinî.

Bêguman dojeh, bihûşt, meşher sirat, siza û bexşanên wê dinê, hemû li gora pergala û sazûmanên wê dinê hatine sêwirandin. Lewre di dîroka mirovahiya de dojeh û bihûştên ku bi destê hêzên zoran û desthilatdar hatine avakirin, di binehişîna mirovan de bi cih bûne. Dîsa li gora baweriyên olî, mirovên tawanbar her çî qasî nigaşên dojehê binin ber çavên xwe û nigariyên wê yên tund çê bikin jî, dojeha ku dê roja meşherê bê dadan, qet neşibe wê dojeha wan a nigaşî. Çimkî dê dojeha rastîn sed carî ji wê dojeha nigaşî û nigarî dijiwartir be. Îcar her çend ku îro em jî rûxan û texprîbatên şerekî nû binin ber çavên xwe û wî bi awayekî neyînî rism bikin jî, ew şerê ku îro pêk were dê ji nigar û xeyalên şerê ku em dişewirinin, gellekî dijiwartir û malwêrantir be.

Digel ku di dîroka civakên çîndar de gellek dojehên zindî û berbiçav pêk hatibin jî, desthilatdarên dinê dixwazin îro jî nû ve li Rojhilata Navîn dojehekê dadin û gelên herêmê bi carekê re bavêjin navê. Belê divê baş bê

zanîn ku dê agirî wê dojehê pêşî kesên ku ew dojeh li dar xistine daqurtîne û wan ji eyarekî bixe eyarekî din. Çimkî cîhan, bi saya zanîn û teknolojiya nûjen bûye nola gundekî biçûk. Hêz û derfeta tu mirovan nîn e ku bikaribin xwe bavêjin devreyê sînorê vî gundî û xwe ji agirî wê dojehê xelas bikin.

Derketina şerekî biçûk an jî herêmi dê bibe sedema serobinbûna welatên derdor û lihevketina tevê dinê. Bi rastî îro roj destpêkirina şerekî herêmi ne tiştekî ketberê û hêsa ye. Çimkî şerê herêmê, dê bibe mîna agirî sor ê ku bi pûşê pirêzeyê dikeve, dê hemû welat û parzemînen dinê bide ber xwe û di laşê mirovahiya de biçêre. Ji ber wê, tu mirovên xwedî hiş û raman an xwedî vî û wijdan, nikarin bi hestên çîminjê tev bigerin û xwe ji vê berpîrsiyarê bêrî bikin. Îro merc û asûnên dinê ji bo pêkanîna karesatên nû û her wisa komkuji û qirkirina mirovan gellekî guncan û kêrhatî ne. Îro çek û xumbereyên kujende yên ku bi destê mirovahiya hatine çêkirin, pêkan e ku di hundirê çend xulekan (deqîqeyan) de bajarekî serobin bikin û bi sed hezaran mirovên bêrî tune bikin. Ev karesat û babelotên ku pêk tên, hovîti, bêinsafî û bêwijdaniya desthilatdarên dinê li ber çavan radixe. Ji bo wê divê tu mirov ji dijmin û neyarên mirovahiya hêvî û gumanê neke. Lewre ne gengaz e ku ew bikaribin arîşe û pîrsgirêkên dinê çareser bikin. Lewre yên ku pîrsgirêkan vê dinê bi destê xwe diafirînin, naxwazin pîrsgirêkan çareser bikin. Jixwe sedem û egera hebûna wan jî ji bo pêkanîna arîşe û pîrsgirêkên dinê ye. Pîrsgirêka dinê ya herî tirsnak û erjeng desthilatdarî ye. Û dest hilatdarî şer bi xwe ye.

Hêrs û çavsoyî hêzên şerûd û êrîşkar bi hemû xofdariya xwe, tîrs û saweke mezin dixê dilê kesên bêrî, mirovhez û aştîxwaz. Belê kes û aliyên ku hevalbendiya şer û hêzên şerûd dikin, dê berî herkesî ew bi xwe di nava dojeha şer de bixeriqin. Wekî ku li jor jî hate diyarkirin, tu kes nikare xwe ji ber agirî wê dojehê bide alî. Kêr zêde dê hemû kes Nesibê xwe ji xisar û texprîbatên şerê dinê hilde û agirî wê dojehê bitamîne.

Sersaxî

Wêjevanê Mezin Yê Kurd, Mehmet Uzun Çû Ser Dilovaniya Xwe

Heyf û mixabin, seet 11:05'ê roja pênçsem, 11.10.2007'an, rewşenbîrê navdar û wêjevanê mezin yê Kurd, **Mehmet Uzun** li bajarê Amedê çû ser dilovaniya xwe û bo yekcarî xatir ji gel û welatê xwe xwest. Koça dawiyê ya romannivîsê Kurd Mehmet Uzun kul û keserek giran xiste nav dilê hemû evîndarên ziman, çand û



wêjeya Kurdî û neteweya Kurd bi vê bûyera dilêş xemgîn û tazîdar bû.

Mehmet Uzun ewqas xizmet bi ziman û wêjeya Kurdî kiriye ku mirov nikare û nizane bi çî awayekê pesindayîna wî bike. Raste ku me Mehmet Uzun ji dest da, lê romanên **Siya Evîne**, **Hawara Dicleyê** û **Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirinê** û berhemên din ên wî wek diyarî dê herdem bi gelê wî re bibin.

Mehmet Uzun sala 1953'an, li bajarê Rihayê ji dayîk dibe. Ji ber xebatên wî ên nivîsandina bi zimanê dayîkê çend caran ji aliyê desthilata Turk ve hate girtin û îşkencekirin. Her ji ber wan gefên li ser jiyana xwe neçar



Mehmet Uzun roja şemî, 13.10.2007'an, li Amedê bi beşdariya dehan hezar kesan hate veşartin

ma li havîna sala 1977'an li Turkiyê derkeve û heyameke dirêj li Swêdê ma. Ew endamekî çeleng ê **PEN** û **Yekîtiya Nivîskarên Swêdê** bû. Di jiyana xwe de, Mehmet Uzun heft roman û gellek ceribandî, lêkolîn û helbest nivîsandine û weşandine.

Li sala 2005'an vegeriya Turkiyê û li bajarê Stenbolê ma. Di Gulana sala 2006'an hate zanîn ku Mehmet Uzun tûşî nesaxiya giran a penceşêrê bûye. Heta dawiya roja jiyana xwe(11.10.2007'an), li destê wê nesaxiya giran dinaland. Termê pîroz yê wêjevanê Kurd Mehmet Uzun roja şemî, 13.10.2007'an, li Amedê bi beşdariya dehan hezar kesan hate veşartin.

Desteya Weşana Agirî koça dawî ya nivîskarê navdar yê Kurd Mehmet Uzun bi xisareke mezin ji bo neteweya Kurd dizane û xwe di xem û kovana ji dest çûna wî wêjevanê navdar ê Kurd şîrk û hevbeş dizane, her wiha sersaxiyê dibêje neteweya Kurd û behî û serxweşiyê dibêje malbat û kes û karên Mehmet Uzun. Riha wî şad be.

Desteya Weşana Agirî
13.10.2007

Bîranîna Apê Mûsa Enter (1920-1992)

Reşoyê Pîrê


Li Kurdistana Bakur, herêma Mêrdînê, gundê Zivingê, di şikeftê de, sala 1920'an, Mûsa Enter ji dayîk dibe. Mûsa ji êla Botan, milê Temikan, ji malbata Mihoyê Teze ye. Sê zarokên wî hene. Enter, Reşan û Dicle.

Mûsa xwendina xwe ya pêşîn, li Mêrdînê û ya îsê li Enedolê kuta dike. Mûsa Ente, cara pêşîn li Enedolê tê girtin.

Ji bo xwendina zanîngê, berê xwe dide Stenbolê, di saxê edebiyetê, beşê hiqûqê de bi cî dibe. Di zanîngê de, pir xwendekarên Kurdperwer dinase. Mîna Mustefa Bucak, Fayîq Bucak, Yûsif Azîzogju...Û bi hev re pir komelan dadimezrînin.

1- Pansiyona şagirtên Dicle sala 1942'an. **2-** Komela Hêvî sala 1943'an. **3** – Komela rizgarkirina Kurdan. **4-** Pansiyona şagirtên Firat sala 1948'an.

Mûsa Enter, di sala 1958'an de, dest bi weşanên xwe dike. Gotara yekemîn ya di bin navnîşana "Eman çî welatekî pêşketî ye" di rojnama "Îlerî Yurt" ya ku li Amedê derdiket, diweşîne. Di sala 1959'an de, gotarekê bi navnîşana "Qimil" di wan rojnamê de belav dike. Ji bo wê gotarê, Mûsa tê girtin. Piştî tê berdan, careke din tê girtin û berê wî didin Stenbolê, di oda 38'an de, şeş heyvan radikeve. Mûsa, di wê şeş heyvan de, pirtûka xwe ya yekem, ya bi navê "**BIRÎNA REŞ**" dinivîse. Di sala 1963'an de, bi Yaşar Kaya, Medet Serhat û Ergîn Koynucu re, **kovara Deng** diweşînin. Piştî du heyvan, conta Tirk, destê xwe didin ser kovarê û Mûsa Enter dixine girtîgehê. Di sala 1965'an Birîna Reş û di sala 1967'an de Ferhenga Kurdî diweşîne. Di 1969'an de, ji ber nivîsa xwe ya ku di rojnama "Dogo" de hatibû weşandin, careke din tê girtin. Di sala 1971'an de, ji hêla dadgeha Amedê ya contayê ve tê girtin û çar sal ceza didine wî. Piştî ji zîndanê tê berdan, di sala 1976'an de, Mûsa Enter vedigere gundê xwe û ta sala 1989 li wir dimîne. Di wê salê de, Mûsa vedigere Stenbolê. Li Stenbolê, kovarên "**2000, Dogru, Medya Gîneşî û Den**" Hevpeyvîn û nivîsarên Mûsa Enter diweşînin. Di sala 1990'î de, pirtûka wî ya bi navê "**Hatîralarim**" ji hêla pirtûkxaneyê "Doz" ve tê weşandin. Di wê salê de, partiya "**Keda Gel**" tê damezrandin û Mûsa Enter cihê xwe di nav refên wê partiyê de digre û dibe endamê komîta partiyê, ta qedexekirina partiyê ji hêla conta Tirk ve, karê xwe berdewam dike. Ji sala 1990'an, dema weşandina rojnama "**Yênî Ülke**" ve, nivîsarên Mûsa Ente, her hefte, diweşîne, biwî nivîsarên wî, di rojnameyên **WELAT, TEWLO** û kovara **REWŞEN** de, têne weşandin. Di 20'ê Îlona 1992'an an de, kalemêrê 74 salî, Apê Mûsa Enter, ji hêla hêzên reş û tarî ve, li Amedê tê kuştin.



Dostaniya Yaşar Kemal û Apê Mûsa Enter, ji demeke dirêj ve ye. Wî di bîst û Sê saliya xwe de dinase. Dostaniya wan ta dawiya jiyana Apê Mûsa berdewam dike.

Piştî kuştina Mûsa Enter, Kemal nivîsarekê di der mafê wî de dinivîse. Ev nivîsar rojnama Tirk ya bi navê û deng "**Cumhuriyet**", di rojên 26-27'ê Şibata 1992'an de diweşîne. Emê hin parçeyên bijarte, ji wê nivîsarê pêşkêş bikin.

" **Apê Musa Enter, di rojên reş û tari de, herdem ronak, hêvidar û bawermend bû. Civak û mirov, çiqas xerab be, wî herdem quncikekî rind û qenciyekek tê de didit. Nêrîn û gotinên mirovan, li hember wî çiqas ters û sert bana jî; Wî bi çavekî nerim lê mêze dikir. Ew bi çanda gelê xwe pir bawermend bû. Bi hemî hêza xwe ve, li dijî wendabûna çanda gelê xwe disekinî û didit ku, çanda gelê xwe, ji çanda cihanê re alîkar e. Ev bawerî, ta dawiya jiyana wî ajot û berdewam kir.. Ji ber baweriyên xwe ve, bi mêranî berxwe dida. Lewre ji hat kuştin. Kuştîdar, an yên Apê Mûsa, dane kuştin, Tirkîyê jî xwerin, Anadol vegeandin gola xwînê. Ew kesan, xerabî û kuştina Tirkîyê dixwazin. Ev karê diktatorên xwîndar in. Tirkîyê, divê neketa devê vê riyê. Em dikevin sedsala Bîst û Yekan, Ev leka reş di eniya me de, mirovatî napejrine'.**

Di vê nivîsarê de, Y. K. Dîsan dike qêreqêr û banga xwe dike welatparêz û welathezan, da ku vê kuştinê ji holê rakin "**Tirkîya û mirovatî, kuştina kevokên aştiyê, wek Mûsa Enter napejrine. Ji ber, evqas sitem û piştî evqas xwînrijandin, lihevkerin pir zor e. Ez di bextê we da**

me, rê nêzîke, wext heye, ji bo xatirê xwîna yên wek Mûsa Enter, ji bo xatirê evîna biratiya hezar salan û ji bû bedewiya biratiya paşerojê, werin em vî karî çareser bikin, tiştêkî ewqas dijwar nîne'.

Yaşar Kemal, nivîsara xwe bi van gotinan kuta dike: "**Bi rastî, eger mirov bi qasî Mûsa Enter, ji welatê xwe hez bike – Eger demoqrasî hebe – emê ji vê astengê derkevin. Ji ber ku, bawerîya min gelekî bi Mûsa Enterên vî welatî heye. Çi Tirk û çî Kurd be.**

Bila bijî Mûsayên Enter, Apê Mûsa "

Apê Mûsa Enter, di dîroka gelê Kurd de, mîna çiyayê Gewir nîşan dide. Û wê di jiyana gel de, herdem bi serbilindî bijî.

Jêder :

1 - Kovara Rewşen. Hejmar 1 . Sal 1996

2 - Kovara Nûdem . Hejmar 7 . sal 1993

Doma Hevpeyvîna Bi Hunermend Aynur Doxan Re



tonmaîster û supervîzor û kesên pispor ên mûsiqê. Em jî mecbûrê mûsiqzanên Turkî ne. Lewra şerî û newarê me pîrnî di tema Kurdî de ne, lê hinek caran jî bêhna Turkî ji wan tê. Helbete ev tişt pîrsa hemû hunermendên Kurd in. Ev jî bêçariyek mezin e. Lazimê konservatûar û akademyên Kurdî bêne danîn ku ev pîrs çareser bibe. Eger dewlet neke jî, bi ya min beledyeyên Kurdî dikarin dest bavêjine tiştêk weha û li ser vê pêşniyarê serê xwe bi êşînin.

Xebatên we yên niha ji bo albumeke nû hebe em wê jî ragihînin xwendevanên xwe.

Niha xebateke min ê amadebûyî tune ye. Lê ez li ser repertuwarê xwe dixebitim û min niyet e ku ez kasetek baş û xurt amade bikim: Hê ev xebat ne geştiyê. Ez baş dizanim ku bîzer û guhdarên min ji min tiştên baştir hêvî dikin. Lewra ye ku ez jî acelê nakim. Bi bêhna fireh wirde wirde ezê xebata xwe bidomînim. Wexta ku min bi xwe got "**erê tamam. Êdî hevîrê me hazir e. Em dikarin bidne tenûrê.**" wê demê emê bîr û raya Kurd jî xebata xwe a nû haydar bikin. Bi vê rêyê ez ji we û ji xwendevanê we re, hez û rêzên xwe pêşkêş dikim û ji were serkevtinê dixwazim. Serfiraziyê jî, ji hemû gelê me re hêvî dikim. Ez baş dizanim ku Kurd hewceyê tiştên baş in. Lewra divê mirov layiqê gelê xwe be. Divê gelê mirov bikaribe bi evladên xwe, bi taybetî jî, bi hunermendên xwe kubariyê bike.

Hunermend Aynur Doxan:

“Hunermend, Oksijena Miletan In”

Hevpeyvîn/Letîf Epozdemir

Wekî destpêk hûn dikarin ve konferansê çawa binirxînin? Kêmasî li gor we çi bû û ji bo

pêşerojê hêviyên we çine?

Pêş hemû tiştî lazime ku ez bêjim amadekirina konferansê wiha gellek girîng û ewqas jî, pêwîst bû. Lewra dibe ku civîna ve konferansê, hunermendên Kurd li hev nêzîktir bike û ev nêzîkbûyî ber bi yekîtiyek ve bimeşe. Her wek tê zanînin, îro gellek pirsgerêk û kêşeyên muzîk û hunera Kurd hene û hemû jî, li benda çareserîkirinê ne. Ji asimilasyon û pişaftin û talankirinê, bêguman musîq, ji hemû waran zêdetir para xwe distîne..Yên ku sitranên welatan çê dikin, ji wanên ku zagonên welatan çê dikin, hêjatir û birûmettir in. Ev gotinek pir binirx e. Lewra ye ku asimilasyonê ewil ji pişaftina muzîka Kurdî dest bi kar kirine. Dibe ku ev konferans bibin silsile û her tim dewam lê were û xal û halên asimilasyon û pişaftinê, ji ser sîngê mûsîqa Kurdî, were paqijkirin û malîştin. Konferans namzetê ve yeke bû , bi raya min.

Her weha Muzîka Kurdî gellek jar û zêif bûye ji ber derb û zerbên biyaniyan. Wisan ku ber bi bê pênasiyê ve daketiye rê. Ev rê rêya xeter û nemanê, rêya xela û mirinê bûye. Ger xebatên weha bi nirx û akademîk nebin, bê şik muzîk tenê bi serê xwe nikare ji ve rêyê vegere. Kor û tîm û ekîbên lêkolîner dikarin di nav xwe de her kes li gor zanebûn û pîsporiya xwe, kar û barên xwe dabeş bikin û bi hêz û xebatêk bijare wê muzîka ku niha sewse û hatiye tewşkirin carek din ji nû ve bi ser esl û astarê wê paşve vegezin.

Ev hêvî min zêdetir heyecan dîke û ez bawerim ku bi xizmet û xebatên wiha di zûtîrîn wextek de dê gellek berhem û çalakiyên baş bi dest bikevin. Her weha çiyê şanaziye ye ku êdî xweş halin ku desteyek bijare lêzan û agdarê muzîkê ji nav jenerasyona nû a Kurdan perwerde dibe.

Ji bo destpêkê ev konferans bi raya min serkeftî bû. Di hemû karan de kêmanî xuya dikin. Her weha ew kêmasiyê ku hatin dîtin, carek din dê nemînin û konferans û xebatên ayende, dê baştir û têkûztir bêne amade kirin. Ez bawer im ku dem û dezgeyên muzîka Kurdî çiqas zêde bibin, ewqas baş e û dê karê me hêsanîtin bikin. Lazime ku rojek zûtir muzîka Kurdî vegere ser koka xwe. Her weha taze aj bide û rabe ser pê. Vî karî jî, têne korên xebatê, dem û dezgeyên wekî ve konferansê dikarin bidin hewil dan.

Li gor we ji bo muzîka Kurdî bigihêje asteke giranbiha divê çi bê kirin?

Ya rast îro jî Muzîka Kurdî geyîştîye astekî berz û bilind. Beramber bi dû, gellek gavên baş hatine avêtin. Ji roja ewil û hetanî îro muzîk kutahî bi jiyana xwe naniye. Lewra folklorê Kurdî tenê û kûreya musîka Kurdî bûye. û dengbêjên Kurd wekî bilbilên baxê behestê, her sitriyane û ji ser lêvên xwe sitran û kilaman kêmanî nekirine hetanî îro. Di diwan û hizûra mazin û mêvanan de her dem wekî şalûl û bilbilan destê wan li pala guhê wan bûye û xasima di wan şevên dirêj ên

zivistanan de hetanî berê sibê qîriyane. Ev kevneşopiyek taybetî û serwetek hêjaye di destê hunermendên Kurd de ku dikarin pê kûbariyê bikin. Lewra şensek wiha di destê kêmanî hunermendên dunyayêdehaye. Sedem ku xezîneyek wiha giranbiha di destê me de heye, lazime em jê gellek îstifade bikin. Reng û rûyê muzîkvan, çi be, bila bibe, divê ew ji kaniya folklorê Kurdî dûr nebin û jê avê vexwin. Her huner li ser aqara xwe perwerde dibe û digêjê astên bilind.

Heyf û mixabin ku îro gellek hunermend û sitranbêj hene ku di nav şaşiyek mezin de ne û hertim bi wî alî, bi vî alî ve kaş dibin. Ew nizanin ka gelo çi bikin. Di nav aloziyek pênasî de ser û dilê xwe di êşînin. Lazime ku ew dev ji xwe kaşîrinê berdin û bi zûyî ve werne ser kaniya folklorê xwe û tîntîtiya xwe li wê bişkênin. Dê bibînin ku ew ê serfiraztir û dilşatir bibin.

Îro divê li gor sewtên nûjen ên dunyayê em jî muzîka xwe bi pêş ve bibin. Dengê me li



derveyê sînorên me jî bê bihîstin. Bizer dema ku guhdariya me bikin bizanin ku em Kurd in û ew sitranên li ser lêvên me berhemên folklorê û çanda Kurdî ne. Ez li gor karîna xwe wezîfeyek weha dikim. Helbete bi min wisa xuya dîke. Nizanim gelo ka bes e yan na.. ? Bê şik têne cehd û hewla min jî, ne bes e. Lazime gellek kesên din jî berê xwe bidne ser warê sewt û muzîka dunyayê. Lê li ser koka xwe tiştên nu nûjen biafirînin.

Em dikarin bêjin hunermendên Kurd bi her awayî mafên ku divê bê dayin distînin. Hem ji aliyê gel, hem ji aliyê sazî û dezgehan û hem jî ji aliyê aborî?

Bi rastî em îro nikarin bêjin ku yek hunermendê me jî, di hal û mercê baş de dixebite. Her wiha rewşa aborî û zirûfên civakî mixabe ku ne ligora xwesteka dilê me ne. Lewra em hunermendên miletek bindest in. Li her cîyekê dunyayê xebatên çandî û hunerî ji aliyê dezgeyên herêmî yan jî dewletî ve têne piştevanîkirin. Yanî huner sîziyek bilinde û perwerdebûyîna huner jî lazime were paldan û ev kar hewceyê piştigiriya dewletê ye. Lê em xwediyê tiştê weha nînin. Lewra em hê jî sêwî ne li dunyayê û bê xwedîne. Lewra tenê kurd in ku li ser rûyê erdê nifusê wan jî 50 milyona zêdetir e û hê jî, bê dewlet in.

Di halek weha de ne qabile ku em di hemû warên jiyandê, di kar û barên hunerî de û di jiyana civakî de serfiraz û rûgeş in. Tu dem û dezgeyê me tune ku nişanên liyaqatê bide me. Em hunermendên gellekî bindest in ku zor daran sitranên me xewa nevana durevînin.

Dê çawa ew qedrê me bizanibin. Tenê dimîne gelê me yê reben.. Ew di nav vê şerpeze hî û bextreşîya xwe de dê bikare gelo çiqas me li ser desta bigre û qedr û qîmeta me bi parêze.? Yan jî jiyana me a aborî dê çawa bigihîjîne astek hemdemî di hal û mercêk weha de.

Lê dîsa jî em ewqas gilîkar nebin baştir e. Eger tîr û eger birçî, lazime ku em dengê sitranên xwe nebin û her tim bi lorînan da ku rojên xwestir, bibînin. **Hunermend oksijena gelên xwe ne.** Dema dengê hunermendan bê sekinandin, milketê wan nikare nefesê bistîne. Lewra em bi dil û can di her qonaxî de hewl didin ku nefesa gelê me neyê birin. Hêvîdar im ku di demek kurt de rewşa hunermend û muzîkvanên Kurd dê baştir bibe.

REWŞA MUZİKA KURDÎ YA ÎRO ÇAWA YE BÎ DÎTINA AYNUR DOXAN. ?

Lazime mirov bi zaniyariyên mûsîqa Turîkî, mûsîqa Kurdî şirove neke. Lewra herdu ne yek tişt in. Her weha her yekek zirûfên xwe ên taybetî hene. Her yek jî wan di merc û aqarê xwe de perwerde dibe. Ev herdu ne berevajiyê hev in. Bi hemû şîweyan jî hev cuda ne û heta mirov dikare bêje ku ne cînarê hev in jî. Lewra zimanê herdukan jî her yek ji cîyek derbûye ku nêzîkî hev jî nînin. Dîsa raman û çand û folklorê zargotina herdukan jî jihev gellek dûr in. Sedem vê yekê, xeterên li ser rêya mûsîqê ji bo herduyan ne bi yek rengin. Yanî wekî ku tê qebûlîkirin, Arabesk li ser rêya mûsîqa Turîkî xeterek mezin e. Lê di nav muzîka Kurdî de hatiye hevîrkirin. Lewra êdî bûye parçeyek ji vî mûsîqê. Keza Pop, îro di mûsîqa me de hê ranebûye ser pê û hêdî hêdî xurt dibe. Bi guncan û îmkânên şexsî ne qabile ku zûtir geş bibe. Lewra berê hunermendên Kurd ê gellekan ber bi dunyayê ve ketiye.

Hunermendên me jî, hê bi sererastkirin û têkûzkirina xwe ve mijûl in. Zêde hayê wan ji muzîka cîhanê a îroyîn tune ye. Tenê ewên ku li derveyê welat dijîn ew hinekî nasyar in, lê bê gûman ev yek ne bes e. Lazime ku mirov li ser muzîka xwe zana û hosta be. Dema ku mirov şarezayê muzîkê be, mirov ji zimanê muzîkê fêhm bike wê demê karê mirov rihettir dibe. Bi vî yekê mirov dikare li ser mûsîqa cîhanê jî, serê xwe biêşîne. Di vîra de tiştê balkêş ew e ku divê mirov tu carî ji kevneşopîya mûsîqê veneqete û ji kok û reh û rişelên mûsîqa xwe a netewî dûr nekeve ango jê cuda nebe.

Îro êdî mûsîqa me jî, mîna hemû warên jiyandê li ser rêya raperî û perwerde û pêşveçûnê ye. Ez jibo pêşerojê hêvîdar im. Lewra ji niha ve van îşaretên distînim. Lazime ji başûr ve dest bi seferberiyê were kirin û bi zûyî mûsîq jî nav lepê dijarwê û xederayî bête felitandin. Lazime zêdetir akadêmî û enistîtuyên huner û muzîkê bêne çêkirin û li ser mûsîqa Kurdî zêdetir lêkolînan çê bin. Di radyo û televizyona de zêdetir cih bidin mûsîqa Kurdî û rêya geşbûna mûsîqê xwestir bibe. Televîzyonê û kanalên taybetî ên mûsîqa Kurdî bêne damezrandin û li ser mûsîqa Kurdî pîspor li hev bicivîn, bernameyek ajdanê dirust bikin.

Her wek tê zanin ku tu sazgehên fermî yan taybetî tunen in ku pîsporan perwerde bikin li ser mûsîqê û torevaniya Kurdî. Ne bestekar û torevan û ristevan, ne aranjor û (**Dom R.10**)

Hejmar 3 Ya Pirtûka “Albama Şehîdan” Derket

Hejmar 3 ya pirtûka **Albama Şehîdan** kete pêşberî xwendevanên xwe. Albama Şehîdan navê pirtûkekê ye ku 2 hejmarên wê îsal çap û belav bûn, di destpêka meha Çiriya Pêşîn a 2007'an, hejmar 3 jî derket. Di her 3 hejmarên pirtûkê de wêne, nav û paşnav, sal û cihê ji dayîkbûnê, berrav, cih û çawaniya şehîdbûnê û herwiha pileya rêxistinî ya şehîdên serbilind û birûmet ên xebata azadîxwazane û neteweyî ya PDK Îranê cih girtin.



Wekî her du hejmarên berê, naveroka hejmar 3, ji destpêkê û jiyana û serpêhatiya 3 rêberên şehîd **Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî** pêk hatiye. Piştê di hejmar 3 û dawî a pirtûka Albama Şehîdan de, şehîdên serfiraz û nemir ên Komîte Şaristanên **Seqiz, Sine, Hevşar, Merîwan, Hewraman, Dîwandere, Kamyaran û Kirmaşanê** hatine nasandin.

Hejmar 3 a pirtûka Albama Şehîdan, bi bergeke rengî û balkêş hatiye xemilandin û 380 rûpel e. Beşa Şehîdan ya Komîsyona Civakî a PDK Îranê ev pirtûk berhev û weşandiye.

Desteya Weşana Agirî, bona encamdana vê xebata pîroz û hêja spas û mandînebûnê ji Amadekarên vê pirtûkê bona xizmet bi riha nemir a şehîdên birûmet ên tevgera azadiya Kurdistanê dike û ji wan re hêviya serkevtinê jî dixwaze.

Li Sine Di Neştergeriyeke Serkevtî De Desteke Qetandî Bi Hev Hate Zeliqandin

▶ Roja duşema borî, li nexweşxaneyê Beset a bajarê Sine, di neştergerî (Operasyon) eke serkevtî de, bijîşkên vê nexweşxaneyê karîn destê zarokekî



9 salî ku li bûyera lihevketina otombêlê ji laşê wî cuda bûbû, dîsa ji bedena wî re hate zeliqandin.

Milê **Kavan Esedpûr** ku bi tevahî ji laşê wî cuda bûbû, piştî 8 seetan operasyonê, ji aliyê bijîşkan ve bi laşê wî hate likandin. Ev neştergeriyeke ji aliyê Dr. Mihemed Beyanfer û Dr. Hadî Beygfer bo cara yekemîn li Kurdistanê bi awayekî serkevtî hate endamdan.

Tê gotin ku Kavanê 9 salî niha li beşa ICU a nexweşxaneyê Beset a bajarê Sine, di bin çavdêriya nojdarana de ye û xwîn di nav demarên milên wî de digere.

Çend Xelatên Nobelê Yên 2007'an Hatin Ragehandin

▶ Elatên Nobelê yê îsal jî hêdî hêdî hatin ragehandin. Xelata Nobelê ya Wêjeyê a sala

2007'an dan niviskara Îngilîzî "Doris Lessing"ê. Lessinga 88 salî bi pirtûkên xwe yê **Giya Stranan dibêje, Deftera Zêrîn** û gellek yê din ... tê nasîn. Li gor daxuyaniya Akademiya Zanyarên Swêdê, ji ber ku nivîskar "şaristaniyeke parçebûyî bi şikbarî, azwerî û xeyalan girîtiye dest, tevgera jinana bi awayeke destankî aniye ziman" layiqî xelatê hatiye ditin. Di daxuyaniyê de hate gotin ku pirtûka wê ya Deftera Zêrîn ku di sala 1962'an de hatiye weşandin, derbarê têkiliyên jin û mêrana sedsala 20'an vegotiyê.

"Doris Lessing" di sala 1919'an de li bajarê Kirmaşan a Kurdistanê Îranê hatiye dinê. Dê û bavê wê Bîrîtanî bûn. "Lessing" dê ji bo xelatê 1.1 milyon Euro bistine. Sala 2006'an Xelata Nobel ya Wêjeyê ji romannivîsê Turk, Orhan Pamuk re hatibû dayîn.

Xelata Nobelê ya Tibê di nav 3 kesana de hate parvekirin

Xelata Nobelê ya Tibê a 2007'an di nav 3 pispor û lêkolînavan de hate parvekirin. "Mario R. Capecchi" û "Oliver Smithies" her 2 ji Amerîkayê û "Martin J. Evans" yê Bîrîtanîyê layiqî vê xelata mezin hatin ditin.

Xelata Nobel ya Aştiyê a 2007'an jî bi awayekî hevbeş ji "Al Gore", Cihgirê Serok Komarê berê yê Amerîkayê û Komîteya Zanyaran ya Navneteweyî ji bo guhertina rewşa hewayê Neteweyên Yekbûyî (Intergovernmental Panel on Climate



Xelatgira Nonelê ya Wêjeyê li Kurdistanê ji dayik bûye



"Al Gore"

Change) yan "IPCC" a ser bi Rêxistina Neteweyên Yekbûyî re hate dayîn.

Gêzer Nexweşiyên Gurçîlk û Mîzildanê Çareser Dike

▶ Lêkolînen nû diyar kirin ku gêzer nesaxiyên demdirêj ên gurçîlk û mîzildankê çareser dike û kevirê gurçîlkan jî ji nav dibe.

Lêkolîna han eşkere dike ku gêzer madeyekê di xwe de cî dide ku jê re



"Calsim Pectate" tê gotin ku rêjeya kulestrolê di xwînê de kêmtir dibe û radeya potasyomê jî zêde dibe.

Hêjayî gotinê ye ku gêzer xwediyê çavkaniyek girîng a karotînoyîdan e ku madeyên kîmyayî ne û mirov ji pençeşêrê dûr dixe.